ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 181

Qebrê wî hîng tezîn bikin
Mala gilîn nûrîn bikin
Kifnê sipî rengîn bikin

Rengîn bikin kifnê caran
’Hifi’z bikin l’mişk û maran
Fireh bikin çar dîwaran

Ebdê min zûr şermûkîye
Xidmetkarê Xudê xûye
Evrû çakkirin ser meye

Evrû ez dêkim minnetê
Mûqabilî vê xidmetê
Cihê xû bînî l’cennetê

Qerar dikit ey meleke
L’qebrê wî vekin quleke
Da cennet b’bînit ’ebdeke

Cennnetê bikin beyane
Cihê xû b’bînin bi çave
Ew laîq xizmetkarane

Ez lew dikim vê hîmmetê
Mûqabilî vê xidmetê
’Hetta roja qîyametê

Herkes b’mrit bê tûbete
Te’heyyûr bit ji heybete
Nizanit wê ç’cewab dete

Ew nizanit wê çi bêj te
Ezmanê wî dê şikête
Qebrê liwî ’tarî d’bîte

Heçî ’ebdê kû nezane
Tûbe nekit j’gunehane
Liwî d’şkêtin ezmane

Ew nizanit ç’cewabane
Ne cîraneû ne mêvane
Liwî d’bîte taristane

Sûal dikit zebbanîye
Bû me bêje Xudê te kîye?
Ew qa’sidê hatî kîye?

Ew nizanit ç’cewab dete
Çûndke yê mirî bê tûbete
Ew d’mînit b’tirsîû heybete

Ewca ku ew zebanîye
Lêdin gurzê agirîye
Qebrê wî tijî d’bit l’agrîye

Ev cezayê ew keseye
Bi mirîtin bê tûbete
’Halê wî dibit eveye

Qebra tijî agir d’bîte
Xudê bi xû dizanîte
Cezay wî kengî xila’s d’bîte

Ya reb, j'weqtê nezi'û sekeratê
Me 'hîf'z bikî j'mûhlîkatê
Bû xatirê (Mu'hemmed seyidûl kaînat)ê

Ey gelî birader û cema'etê
Min gût beyta sekeratê
Da buxû b'girin 'îbretê

Ya reb, b'navê xû û Mu'hemmed key
Busulman wa'zi'h û katiba 'hîf'z key
Re'hmeteka zûr l'ser wan b'key

(Ya reb, 'sellî 'ela Mu'hemmedel Mû's'tefa)
(We 'ela alîhî we e's'habîhî ehlel 'sîdqî wel wera)
(Îla yewmîl 'heşrî wel neşrî wel 'sefa)

(Sûmme hedîyeten mînna îla rû'hî xeyrîl wera)
(We îla rû'hî alîhî we e's'habîhî el enwera)
(We îla kaffetî ehlîl îmanî) seransera.

**'Îrq û xînav: xûşî û nexûşî derûn.**
**Cefa: xem û xefet.**
**Nicûd: bîmar.**
**'Ûd: amîrê 'ûdê (dilê wî dinale wek 'ûdê).**
**'Xew'xa: hera û hawar, rûdaw.**
**Cema: kûmbûye, kûbûtewe, cemabûn.**
**Hilbûrî: ji hev veqetîya, ciya bûwewe.**
**Hêve wêve: hêrve wêrve.**
**Pal: penay yek.**
**'Sewab: başî, çake.**
**Derfet: bîf, fûrset.**
**Sergerdan: ser lê şêwaw.**
**Berî: dûrbûn, berîi, dûr nakewî.**

**Hevdek: dûst, heval, hawrê.**
**Tevave: tewaw, temam.**
**Lê rêk dibin: lê zîq dibin.**
**’Xesal: mirîşûr, mirdûşûr.**
**Melezîne: bi aramî, le serxû, bepelene.**
**Derwar: tê alandin.**
**Kulfet: mal û zarûk, mal û minal.**
**Gurz: gûpal.**
**Fe’sî’h: rewan.**
**Melî’h: çak, baş.**
**Taristan: tarîk sitan, tarîkistan.**
**Qa’sid: nameber, peyk, firistade.**
**Çûndke: çûnke, ji ber kû, çimkî, le ber ewey.**
**Mûhlîkat: derd û renc û nexûşî.**

(*) Beyta sekeratê: ev helbeste di destxeta Şêx Memdû’hê Birîfkanî da tunebû, me ji destxetek din da dîtîye û li vir çap kirîye.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 185

## Herf el-Waw (pîta ”Û”)

### Kasa mestîyê

Bi sirra qu’tbê Geylanî, me kasa mestîyê dîbû
Şeraba nab Romanî, di wê se’itê me nûşîbû

Hilîna perdeya canî, ji teşrîfa tu sul’tanî
Şukir ev ’xewsê Geylanî, me der ’ehdê ’sîba dîbû

Mûşerref kir dilê Nûrî, bi destê xu mûbarrek kir
’Hicaba sîneyê pir ’xem, bi destê xu hilanîbû

Bi fey’za ’alema qudsî, ’sefandî dil mû’teher kir
Cûneydû kerxîû ceylî û Mu’hyeldînê Şamîbû

Li mi’hrabê ku westa bû, tecella da dilê Nûrî
’Eceb nûrek bidagirtî, ku ew fey’za îlahîbû

Sicûda dilberê lazim, ji ’irfanê veder nabit
Tu rabe dergehî qu’tbî, biwê sucdê me ’safîbû

Me’anî min gelek dîtin, serê hemîya ’ibûdîyet
Kesek ma dame ew xeli’et, belê şêxê me’anîbû

Li ’he’zret qadirê ekber, bixef canim li dîwanê
Li her ca û mekan damin, ’hi’zûrek Kesnezanî bû

Îmamê qudwetim îrû, ji lu’tfê qu’tbê Geylanî
’Elem da dest û re’hmet kir, ji nûbenda berahîbû

Ji be’hra qulzema qu’tbî, ji bû min cû û cûbare
Çixûş ewras û qismet bû, ji be’hra şêxê carîbû

Sîyeh seywanê tacê me, ji me se'itê demê qe'sda
Dilê kul herdem û gavê ji bû şêxê me xalîbû

Dema ewwel bi ze'hmet bû, cemal û dîtina 'husnê
Bi te'ibû rencû azarî, çiku dûrû dirazîbû

Kesê ew lê bikit minnet, dibit roje li 'esmanî
'Heta hingî bi'zulmet bû, liwî 'ebdî giranîbû

Eman ey qu'tbê Geylanî, bi 'heqqê rebbû ceddê xû
Meke mehcur evî Nûrî, feqîrê te Birîfkîbû.

---

**Nab: entîqe, kevnare, baş, bêwêne, pir bûha.**
**Roman: naveke wek "şeraba roman".**
**Fey'z: gewreyî, nûr.**
**Sicûd: kirnûş, temene.**
**'Ibûdîyet: bendegî, kûyleî.**
**Cû û cûbar: cûgele, le rûbar giçketire, ji rûbarî biçûktire.**
**Dûr û dirazî: dûr û dirêj.**

**’Ta’ûn**

’Ta’ûn hate dinyayê, çi afat û belabû
Sê rûza ketne tayê, yacarî bê wefabû

Ew kulka sûr û şîna, sê rû ketne nivîna
Yacarî ta b’teîna, paşî j’dinê cuda bû

Hej qirqûrê ’heta êtîtê, agir berda kibrîtê
Malek nema neçîtê, şîn û girî lê rabû

Gehişte Bazîdkêû Memanê, ’alem îna yemanê(**1**)
Qu’tbê Gelîrûmanê, ew li pêşya wa rabû

Seyid ’Ehmed çu b’rêkê, nehêla b’gehne ’siftîkê(**2**)
Zivrandin ew li rêkê, Quran di destîdabû

Seyid ’E’hmed ’Huseynî rê girt li roja eynî
Tûyî qûrretûl’eynî, pê’xember hatû rabû

Pê’xember hate nik wî, ’ta’ûn neçû gundê wî
Kesek nebû şibtî wî, ew j’me hemîya çêtir bû

---

(**1**) Şêx Memdû’hê Birîfkanî nîşanek danaye ser vê rêzê û di perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê ev rêz bi awayek din jî nivîsandîye: ”’Ta’ûn giheşte Memanê, ’alem îna yemanê”.

(**2**) Şêx Memdû’hê Birîfkanî nîşanek danaye ser peyva ”b’çine” û di perawêza rûpelê da li jêr eynî nîşanê nivîsandîye ”b’gehne”.

**Herf el-Yai (pîta ”Î”)**

**Di ba’xê we’hdetê**

Di ba’xê we’hdetê ey dil, dizanim her tu sul’tanî
Li textê kişwerê Hindê, ’eceb ’irfan û xaqanî

’Ezîzê Mi’sir û Şamî tu, li derbabê îmamî tu
Vimewlay xûş ’xulamî tu, ’xulamê şahê re’hmanî

’Xulamê şahê wehhabî, îmamê qu’tibû mi’hrabî
Te dil der senc û sencabî, ’teleb enwar û ’irfanî

’Teleb ’irfan û enwarî, bi ’ilmê xû tu xûndkarî
’Terîqa ’heq tu salarî, xelîfê şêxê Geylanî

Xelîfê na’sirê sunnet, tûyî rehber derê cennet
Nehî ber ’talibê mînnet, ji nesla şahê ’Ednanî

Ji nesla seyidê ’alem, fexarî her benî Adem
Qesem kim vê sirrê nadim, bi emlakê Suleymanî

Bi sirra ’heq xeberdarim, bi dil enwar û esrarim
Li d’ewa şibhê kerrarim, di gel dêwan û şey’tanî

Li zarê wî dikim jehrê, li ser wî her dikim qe’hrê
Neman da wevimin behrê, gunah û zenb û ’u’syanê

Bi tewfîqa xudawendî, gunahan her bikim çendî
Bi lu’tfa xaliqî min dê, ’efûkit ew bi ’xufranî

Di gel zîlla xû tewwabim, feqîr û nazîlê babim
Vime’ibûdî xû ewwabim, ji ’îbadet û î’hsanê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 189

’Eyan dil nakitin reybê, di dînî nakitin ’eybê
Di babê dîtina ’xeybê, dibînim nûra îmanî

Bi dil min dî cemala ’heq, digel herşey bîla mû’tleq
Nizanî min ’hewalê ’heq, be te’hbîrî be mîzanî

Te dil ’tûre tijî nûre, te dil şehkasê fe’xfûre
Were Nûrî me destûre, xudî xwandîne dîwanî

Xudî xandîn ji bû dînê, şukur vemin nakit kînê
Bi dest û zar û amînê, bikit ’ebdê Birîfkanî

---

**Kîşwer: wilat, welat.**
**Xaqan: padişayê Çînê bû.**
**’Irfan: nasîn.**
**’Ezîz: padişayê Misrê bû.**
**Sinc û sincab: bê wêne, bê nimûne.**
**Xûndkar: padişayî gewre, padişayê mezin.**
**Salar: serwer, sertîp.**
**Fexar: şanazî, gewreyî, mezinî.**
**’Eyan: aşkira, aşkera.**
**Mîzan: endaze.**
**’Tûr: çiyayê ’Tûrê Sînai (çiyayê pê’xember Mûsay digel Xwedê peyivî).**
**Şehkas: kasey şahane (şitêkî pir bûha û qîmet).**
**Fe’xfûr: şahê Çînê bû, şahê Sînê bû.**
**Kîn: riq, rik, dijminatî.**
**Zar: dem, dev.**

**Li te me'zher**

Li te me'zher ne'heceb, bû çi me rencîne dikî
Me xeberdare ke tu b'seddê bikî, ûzî dikî

Te bi 'ûzzet li xû dergah kişandî menebîn
Bi cewari'h te dibînim, li me yêk cûrî mekî

Me heme 'i'zwe lîsanin ji te zîkra we dikin
We nebim her kê dibêjim remeqî zêde mekî

'Eceb ez fanî bûyîm her ji fena 'hey vebûyîm
Bitelef rû'hê dibim kû jime kifnî venekî

Xidmetek bê 'hed û 'ed bû te me teq'sîrî nekir(**1**)
Lew me bi renc û te'ibê da li şeddadî meşekî(**2**)

Te nedî 'xedweh û îsalê heme qebrê me bûn
Vebûrîn berzex û 'heşra tu li nefsa vedikî

Nefesa 'eynî 'heyatê ji tera cumle me da
Eve weqtê tu 'hîsaba 'hesenata me bikî

L'yêk li yêk qed me nedî rû'hê rewa'ha cesedî
Te rewa'hek heye ger dê tu rewa'ha me bikî

Edebek lazime ez dê weh bikim, çakî edeb
Edebek wacibe şukraneyê adabî mekî

Me cemala teye mu'tleq, kire qîbla 'emelan
'Hesebek ha'zire xa'tir me nezanî bû ji kî

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 191

Xemilîn, çak cemilîn, ’talibê etrabê tuyîn
Me xumara te divêt, çake şiwarê me şekî

Leqeba wa’sil û şêxa, me ’eceb xûş leqebin
Bi cefa cewrê, çewa çake bi dil tûbe bikî (*)

Gelekî qenc û ’ezîzan ji ’sidûda ce’hidîn
’Hesedîn pir kemedîn, ’hetme nedîrîn kemûkî

Te veda ’erşekê ex’zer, sekinîn em kû li ser
Me ecel dest û geha te, kû qedem dame mekî (**)

.........................................................
Ezelî da te nivîsîbû, ku dê herwe bikî(**3**)

Bike ’sed şukrê xuda destî bikêşe ji hewa
Qet nebê nîne wicûdek, me bi ’hewlû melekî

Çi hewa ’heqqe hewa ger te ne kir ’heyf û ’heya
Were ev weqte gehate, leqeba û kundî çi kî

Qelemê nesxê xuda nesxa me kir, nesxê te kir
’Elemek da me û tacek, were sa’hib ’herekî

Qedemê ’sidqê merasix, qedem û be’hrê ’xemim
Çi ku ’sed cer’hû weda’xim, te li min ger neşekî

Leheba ’işq û şihûb, dane bi can û cigerim
Çu bûhatên li hebî, şe’hme û le’hmê belekî

Se’hera dengê ceresê bê’heddî em mest kirîn
Elema dengê ceres pêwe ’sefakir tenekî

Bi se'her yêkdu xeberda, vemera e'hd û eser
Li dilê suxtehî ma 'hurqetê jehra, gerekî

Qede'ha 'eksî ji kusretê berqa we'hdetê kir
Meger ev 'ekseyî berqa qede'ha şu'ibe nekî

Li te ev 'alemê 'xebra ji 'xubarê vemijin
'Teleba 'alema qudsî bike Nûrî melekî

We dikim hîvî ji dergahê te ey barî xuda(**3**)
Tu li 'heşrê me û me'hsûba şermende nekî(**4**)

Di 'hîsaba 'emela, da jite şermende nebîn(**5**)
Tu ji bû Nûrî û etba'a derê xuldê vekî(**6**)

Li 'hizûrê te digel Nûrîye we'idehî kû qet(**7**)
Li du'a û 'teleba hîç ya bikit reddê nekî(**8**)

---

**Rencîne: rencandin, mandûbûn, ze'hmetkêşan.**
**Xeberdare: pê agehîn, agedarîn.**
**Cûr: şêwe, awa, awayî.**
**'I'zwe: endam.**
**Remeq: nefes, tîn, hinase.**
**Fanî: neman.**
**Bê 'hed û 'ed: bê 'hed û endaze.**
**Renc: ze'hmet, rencandin.**
**Şeddad: kesê kû xûdandesthilat, kesekî xawen deselat.**
**Rû'hî rewa'h: rû'ha şad û azad.**
**'Heseb: şert û merc, delîl û bûrhan.**
**Bû jikî: bû kê, bûy kê.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 193

**Xumar: serxûş, mest.**
**Cewr û cefa: xem û xefet, bê wefayî.**
**'Hesed: 'hesûd, êreyî.**
**Nedîrin: nîne, nîyane, tuneye.**
**Kemûkî: hindek, hindêk, kemêk, piçek.**
**Dame: dav û qeyd.**
**Kûndî: kêmî, kemî.**
**Nesix: batilkirin, pakirdnewe, kûjandnewe.**
**Cer'h: birîn, zam, zexm.**
**Se'her: si'har, beyanî.**
**Dengê ceres: dengê bangê sibê, dengî bangî beyanî.**
**'Sefa: şad, bi keyf, xûş'hal.**
**Sûxte: sûtî, sûhtî, sûtaw, şewitî.**
**Qede'h: pîyale, kase.**
**Berqa we'hded: nûra Xwedê, nûrî Xweda, nûrî yektayî**
**'Xûbar û mij: tem û mij.**
**Qudsî: pîroz.**
**Şermende: şermizar, rûzerd.**
**Xûld: behişt.**
**Ceres: zengilok, zeng**

---

Rêzên vê helbestê, yên ku me jimare danîne ber, jimare (1) heya jimare (8) di destxeta Şêx Memdû'hê Birîfkanî da tunebûn, me ji destxetek din da dîtîye û li vir zêde kirîye, bi eynî rêzkirina di wê destxetê da.

(*) Şêx Memdû'hê Birîfkanî ev rêz bi awayekî din nivîsandibû,
"Bi cefa cewrê, çewa çake bidil kî belekî"

(**) Di destxetek din da li cihê vê rêzê bi vî awayî bû:
Ezelî da te nivîsîbû, ku dê herwe bikî.

**Kes bi ’halê min nezanî**

Çend dibêjim, çend beyankim, ser û ’halan lêk ’eyankim
Mexfîyanê aşkerakim, kes bi ’halê min nezanî

Ez nizanim sirr û ’halan, ah ji destê çav ’xezalan
Her dinalim meh û salan, kes bi ’halê min nezanî

Meh û salan her dinalim, şev û roja ’talibdarim
’Aşiqê bejna şepalim, kes bi ’halê min nezanî

’Aşiqê bejna le’tîfim, xeste’halim pir ’ze’îfim
Mubtela qama elîfim, kes bi ’halê min nezanî

Xeste’halim, pir fename, j’yar û dûsta yê cudame
’Aşiqê nûra xudame, kes bi ’halê min nezanî

Hadirî min dît ji wêve, qameta nazik ji pêrve
Dil li min ker kir ji wêve, kes bi ’halê min nezanî

---

**’Eyan: aşkira, beyan.**
**Mexfîyan: nihênîyekan, sirekan.**
**Xeste’hal: mebest li vir (perîşan, mandû).**
**Mûbtela: tûş, dûçar.**
**Qama elîf: bejin û bala zirav, bala ’er’er.**
**Fena: fanî, neman, li vir (xerîkim, emrim, xerîkim li naw eçim).**

**Qenc û ewlîyai**

Hindî hebin sa'hib hewes, be qîsmetê roja eles
Wan xû peristî bu 'ebes, bixû diçûne sûcdetê

'Sa'hib şîmalin bênesîb, yêkser nesaxin bê 'tebîb
Êwê rojê nabit qerîb, evrû nabînit qurbetê

'Ebdê xudayî min vîya, navê wî qenc û ewlîya
'Heşirkirna vî qencîya, digel ehlê se'adetê

Cennet mekanê etqîya, cehnem mekanê eşqîya
Heçê ku yêk li wan vîya, dê l'nik wî bit qîyametê

Xudê wereng fermankire, nêzîka qenca 'tahire
Viyana xiraba agire, hişyar bibin ji 'xefletê

Bawer bikin vî xeberî, wê hatye l'nik pê'xemberî
Kesê nebit pê bawerî, kafir dibit wê sa'etê

'Heşrate êy aqil temam, lazim bizanin xa'sî û 'am
Dûrî 'heşrê di gel kîram, ye'inî çakêt vê ûmmetê

Hindî li ser 'teb'ê wabî, nabit ji wa qet cuda bî
Hindî hebî yarê wabî, axiret be 'hubba qenca tê

Agir bi 'hubba xiraba, eveye ne'sa kîtaba
Meclîsa pîsa, tu raba, xaric dibî ji 'zulmetê

Qet cîn li ber cîn narevin, qet gurg û pez vêk nakevin
Qenc û xirab 'ziddêt hevin, vêk nakevin yêk le'h'zetê

---

**Hewes: arezû, awat.**
**Eles: (elestû bîrebbîkûm) îşarete bû ayeteka Quranê.**
**Xûperist: xû zil zanîn.**
**'Ebes: bêhûde, beyhûde.**
**Wereng: bi vî rengî, bew cûre.**
**Ferman: destûr.**

**Ehlê civatê**

Ey gelî ehlê civatê, guh bidin vê qî'setê
Da ku 'hasil kin necatê, qet nebînin ze'hmetê

Ew 'hedîsa Mu's'tefa ye, bûme îslamê gehaye
Herkesê guh lê nedaye, ê xisare l'axiretê

Kes nebêjin ew wenîne, xeberê şahê emîne
Ji 'hedîsê min derîne, şer'i û qî'se û sunnetê

Nis'hetek min bû Xudê kir, beyteka men'zûm min çêkir
Bû misilmanan virêkir, da bizanin 'hîkmetê

Ey gelî meznû biçûka, 'talib û ehlê silûka
Hem geda û hem milûka, guh bidin vê nis'hetê

Ev dinya darul 'xurûre, sa'hire yêkser ficûre
Herkesê jê çûye dûre, geşte darê ra'hetê

Bû kesê munqad nabit, herkesê pê mûlteqabit
Lazime her jê cûdabit, da nebînit 'hesretê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 197

Herkesê ’aşiq liwêbit, tabi’î wê sa’hirêbit
Rûreş û dûr li Xudêbit, kefte narê ‘hîrqetê

Kesê ew ji dil ’hebandî, zîneta dinya cemandî
Qebrî agir lê reşandî, çal û beyta ’zulmetê

Ser neda qarûnê ’ta’xî, rû neda şeddadê ba’xî
Cennetek çêkir ji ba’xî, qe’sde b’çîte cennetê

Sa’eta cennet temam kir, xaliqî bu întîqam kir
Hadirî mergê xû ’tam kir, da nebînit lezzetê

Lezzeta fanî betale, merteba wî her zewale
Cahilî vêra hevale, ra’hetî ser nadetê

Kî dibêt dunyayî qence, ger hebîtin zêr û gence
Her dibîte te’ib û rence, wek diçîte ’he’zretê

Qehwexana ’xafilane, xanedana cahilane
’Edûwwê ehlê dilane, ’xeflet û pûtxanetê

Dinya darê sermestîye, fincana mey di destîye
Perde li çavan bestîye, weyla li ehlê şehwetê

Xûşîya te’hlî li dû bit, ’su’hbeta ’xaret li bû bit
Her mekan cabê ’edû bit, ’sub’he wextê ’xaretê

Hemnişînê wê civatê, qed nekin pê îltîqatê
Her bikin daim xebatê, dûr ji wê meji’xeletê

’Sali’han hem sirrê ’sali’h, ’tali’han dilbexşê ’tali’h
Raste ev qewlê te nasi’h, der ’hedîs û ayetê

Dest te ji dinya veristin, em ji cama wê dimestin
'Heyfe em dinyaperistin, çake jê b'kin tubetê

Çake em malî belav kin, j'me'hbeta wê xu me'af kin
Herdu çavê xû pirav kin, j'ber girîn û xeşyetê

---

**Necat: rizgar, riha, necatbûn.**
**Ficûr: facir, gunehkar**
**Mûbtela: tûşbûn, duçar, giriftar.**
**Qarûnê 'ta'xî: dewlemend, be desthilat.**
**Şeddadê ba'xî: dewlemendeke kû behişt dirûst kirîye.**
**Hadirî: yêkserî, di gavê da.**
**Genc: tela, zêr.**
**Xanedan: mebest li vir "cih, şiwên".**
**'Edû: dûjmin.**
**Bûtxane: (bût: senem, peyker), cihê 'îbadetkirina senema.**
**Sermest: serxûş.**
**Hemnişîn: heval, hawnişîn, hawrê, dûst.**
**'Sali'h: mirûvê baş, pîyaw çak.**
**Mej'xele: derdî serî, derdê serî.**
**Na'si'h: ne'sî'het, amûjgarîker.**
**Dinyaperist: dinya xûşwîstin.**
**Me'af: bexşîn.**

**Têkela qenca**

Têkela qenca ji dil kin, dil di gel wa mutte'sîl kin
B'yek ji wan xû muştemîl kin, da bigehne dewletê

Dewleta Xudê ku dayî, dewleta darûl beqayî
Ew li nik ehlê xudayî, tête kar û 'su'hbetê

Têkela qenca se'îde, yarîya pîsa be'îde
Agir û 'zulm û pelîde, têkel ehlê 'zulmetê

Yarîya pîsa 'ezabe, têkela wa pûç xirabe
Hem cefayek bê 'hisabe, terk bikin wê zumretê

Terka xiraba wacibe, yêk sa'etê d'gel wa nebe
Herçî di gel wa ra'xibe, qet pê nekin 'sedaqetê

Ma qenc di gel 'zalim bîtin, ger 'alim û fama bîtin
Qencî ji wan çê nabîtin, e'llah dizanit 'hîkmetê

Ma av di gel agir dibit, 'sali'h li nik facir dibit
'Ebdê li nik 'ha'zir dibit, zûzû dibînit qeswetê

Qeswet çîye, dil 'tarîye, agir li 'zalim barîye
Le'inet ji bû wan hatîye, jê dûrbibin her sa'etê

(La terkenû) nehya me kir, 'hikmet dizanit lew we kir
E'llah ji bû me we'ize kir, nehya me kir ji mû'hbetê

Ji mû'hbeta 'zalimkera, ji yarîya 'eqilkera
Hişyar kirin li min fere, bû 'xafilan ji 'xefletê

---

**Darûl beqai: mebest li vir "dinya din e", malî hemîşeyî, malî heta hetayî.**
**Pelîd: pîs.**
**Cefa: xem û xefet, bêwefayî.**
**Zûmret: deste, tîm, cema'et, girûp.**
**Facir: xirabkar.**
**Qeswet: sitem.**
**La terkeno: (erb.) xu mezin nebîne.**
**'Xeflet: bêhûşî, kem terxemî.**

Ev herdu helbestên Şêx Nûreddînê Birîfkanî, yên bi navê "Têkela qenca" û "Ehlê civatê" di destxeta Şêx Memdû'hê Birîfkanî da tunebûn, me ji destxetek din da dîtîye û nivîsîye.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 201

**Şêx û mirîd**

Cem'îyeta 'sa'hib dila, e'sla wi'sûla wa'sîla
Nabit temam û kamîla, îlla bi cem'a we'sletê

We'sleta şêx û mirîda, ferbûye l'aqil reşîda
Ey gelê qenc û se'îda, qenc bikin semi'îyetê

Şûlek heye nîfaqîye, şertê mirîdî rastîye
We'idey di gel şêx gûtîye, fer'ze bi cîket xidmetê

Nabit mirîd rayek hebit, fer'ze di şêx da ber'zebit
Da rûzena 'xeybê vebit, rûdit şuhûda 'xeybetê

Nef'sa we ba'tin cewhere, lakin qesawet da sere
'Sûtin bi agirî fere, da aşkira kit cefwetê

Cewherê nefsê 'sefînin, perde bê 'hed 'ucb û kînin
Perdeya yêkser hilînin, da kû se'hkin zînnetê

Herkesî gencek 'ecîbe, nefs liser mar û 'selîbe
Xû vîyan 'hucba reqîbe, quflê mîfta'h naketê

Terka wicûdê wacîbe, da hûn bizanin 'hacîbe
Me'ibût tewa'zu'i 'talîbe, pavên ji xû vê şîrketê

Çendî ku me îşrak hebit, nabit ku me îdrak hebit
Pakîze canek pak hebit, dûrîn ji rê ehlîyetê

'Sûfî qet 'safî we nabit, 'sînepur kîbr û riyabit
Dê ji wan qewma cudabit, dînfirûşî û rûmetê

**E'sla wi'sûla wa'sila: şertê gehiştin bi wî tiştî, şertî gehîştin bew şite.**

**Rûzena: kunek kû runahîyê didit, kunêk ke rûşnayî edat, delaqe, kunawece**

**Cefwed: sîtem, zulm.**

**'Icib û kîn: riq û çîn.**

**Îdrak: têgeyîştin, têgihîştin.**

**Pakîze: pak, xawên.**

**Sîne: sing, mebest li vir "dil"e.**

**Kîbr û rîya: kesê kû xwe mezin dibîne, xû be gewreyî zanîn.**

**Rûmet: gewreyî.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 203

**Gelî ’sûfî feqîra**

Ey gelî ’sûfî feqîra, guh bide gûftarê pîra
Ni’s’hetê şêx û kebîra, qet nekin jê nefretê

Ni’s’hetê ’sa’hib şunase, rehberê ehlê qîyase
’Heyfe têkin kêm û kase, qenc bizanin ’hîkmetê

’Hîkmeta sirrê ’terîqê, keştîya be’hrê ’xerîqê
Keis û fincana re’hîqê, xatema mextûmetê

Xatema mulkê beqayî, her emîn d’destê xudayî
Bê edeb hadir gihayî, nar û şu’ila ‘hîrqetê

Bi rastîyê şûl çê dibin, herçî dilî xûk tê hebin
Dinya û axiret jê diçin, rûseh j’qedr û qîmetê

Rastî ’eyane şibhê roj, xaîn ’herîqê nar û dûj
Hindî hebin hemîya bi ’sûj, bi kêr çi kare ew netê

Hindî darin, hindî berin, eger rastin di mêr serin
Eger xwarin, bû agirin, xasim ehlê me’i’sîyetê

’Ebdê kû ev qencî li nik, eger mezin, eger kiçik
Dê wî hilînitin sivik, li ser textê sil’tanetê

Hindî emîn û ’sadiqin, ew îmamêt dilaîqin
’Sa’hib keşf û ’heqaîqin, ew muste’heq încametê

Îmamêt dunya û dînin, ’sa’hib dilin dibê kînin
Bû ’alemê ew emînin, da’îne j’bû hîdayetê

Ger ’alimîn, hûn bizanin, çend ’sûfîyêt musulmanin
Bi dil tabi’êt qencanin, dûrin jiehlê kerametê

Ger ’aqilî hûn bibîn, ’ebdî qencî li nik nîn
’Hubba wî nik qenca nîn, nêzîkîya ehlê fîtnetê

Rastemeyl di gel rastane, xwaranmeyl d’gel xwarane
Dunya jî yêk wesane, bi vê beyan û nî’sbetê

---

**Şûnas: nasîn.**
**Keştî: gemî, belem.**
**Hadir: yêkser, di gavê da.**
**Xûk: beraz.**
**Rûseh: rûsîyah, rûreş, rûyî reş, rûzerd.**
**Nar û dûj: agir, (dûj: kiz û mat).**
**Kîn: bû’xz, riv.**
**Rastemeyl: layingirê rastîyê, arezûyî le ser rastîye.**
**Xwaranmeyl: layingirê çewtî û xirabîyê.**

## Dil

Dil bi xû şahê emîre, ev cesed jêra esîre
Sa'etê dil bêt mûşîre, xûş emre li re'îyetê

Herçî emrê wî mûrade, ger 'sala'heû ger fesade
Qalibî nav lê beyade, dê bi lez kit xizmetê

Ew 'hakimê textê cesed, hindî edakit karê bed
Mu'hkem dibin pê bab û şed, pur 'xem di qesra 'hesretê

'Hakim divêt 'adil bitin, da şûl bi kam û dil bitin
Herçê vîya 'ha'sil bitin, êmin dibit j're'îyetê

'Sul'tanîya dil daime, e'i'ta bi emriş qaime
Ger 'adile, ger 'zalime, 'hukumî dikit bi quwatê

Ew rehberê wî 'eskerî, rû'h û cesed bû miştерî
An ew delîlê agirî, yanî gehişte cennetê.

---

**Cesed: ten, beden, leş, laş.**
**Mûrad: arezû.**
**'Sela'h: çakî, başî.**
**Fesad: bedî, xirabî, nebaşî.**
**Karê bed: karê xirab, karê nebaş.**
**Kam: arezû.**
**Êmin: emîn.**
**Qaim: payedar, rawistayî.**
**Mûşterî: miştерî, kiryar.**

**’Hakimê ’zulmê bikit**

Her ’hakimê ’zulmê bikit, emrê Xudê bicih nekit
Bi destê çep ka’xez dikit, roja ’heşrêû qîyametê

Rûreş dibîtin wê demê, dê çîte alê cehnemê
Dê multeqabit be’xemê, xalî ji lu’tf û re’hmetê

We’sîyeta min li we bit, kes nêzîkî zalim nebit
Re’hmet ji bû wî dê hebit, rûysipî dibîtin axretê

Nêzîkîya wana jiher, l’enet ji balê têtе ser
Rast û durustin ev xeber, ne’sa ’hedîs û ayetê

’Zalim di gel ’zalim dibit, ’alim di gel ’alim dibit
’Hakim di gel ’hakim dibit, be î’itîbara ulfetê

Hemîya ji cemi’a ewlîya, dûre ji cemi’a eşqîya
Herçê te ew ji dil vîya, ew cînsekin be nîsbetê

Her kesekê xizmetkere, ew dûstê mîrê ekbere
Wi’llah ’ezîzek serwere, herdem dibînit ne’sretê

Ta’et kirin şeinê weye, karek ’e’zîmeû zêdeye
Tacê wîqarê bû wîye, ’ebdê meş’xûl bi ’ta’etê

’Ebdê bixazît me’tlebê, hadir Xudê dê bêt lebê
Xasme du’ayê nîvşevê, xûşxûş dikit îcabetê

Xaliq ne’sîr û ’îzzete, ’ebdê ji bû b’kit ’ta’ete
Daîm be ’ewn û fur’sete, ’heq bû dikit vê ’xîretê

Çendî feqîr û miskînin, ew dil ’hezînû d’xemgînin
Hîvî û rica j’kesê nînin, îlla xudanê qudretê

Her ’ebdê ku teqwa hebit, her çendî wî yarek nebit
Dê puştegîr milyakebit, be ’hîf’z û ’ewn û ne’sretê

Mewla gelek ’xîret heye, ew seyideû rebbê meye
Her ’ebdekî behrek heye, jê îftîqar û xeşyetê

Însan hemû bû ’taî’in, mexlûq ji bû her camî’in
Hind muşterî bû baî’in, hindek di emrû xidmetê

’Heywan û cînêt be’hr û ber, mewla dikit ’hukumî li ser
Yêkser di fermana keser, besîneder tew’îyetê

Hindî hene însan û cin, xilmetkerê şahê mezin
Yêkser di fermanê diçin, fermanberin li meşyetê

Ferman dikit şahê refî’i, ’ebdê di fermanê mu’tî’i
Însan û cin yêkser cemî’i, carî dikin tebi’îyetê

’Ebdê di emrê sul’tanî (zûl qûwetî ’elel şeinî)
Mulkîyeta Suleymanî, ’heq dê bi î’hsanê detê

Mulkê Suleyman xateme, xatem bi xû cama ceme
Qey’sere yanî cemceme, ya ba’xevanê we’hdetê

Ba’xê ku mîfta’h kafe lê, şahînşahê en’tafe lê
Girdanî gerdê qafe lê, qu’tbê li ser mulkîyetê

Qu’tbê li ser textî meşî, cedwel ji be’hrê dedgeşî
Sîmûr’x û sîha perweşî, îna meqamê şuhretê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 208

Îna meqamê şahîye, şehbazê be’hrê mahîye
Wê hate rex bînahîye, meydan gihande we’sletê

Ew mahîya Sey’hûn çîye, Nîl û Firat û Dîcleye
Yeksû nemewca lucceye, asane ew l’mahîyetê

Mewca li be’hra qulzeme, keştî li benda mu’hkeme
Be’hra nemanê mud’xeme, sebba’hê be’hra luccetê

Sebba’hê be’hra nûn û kaf, xurşîdê lêda qafî qaf
Mehtabî ’halê şîn û saf, ’xerbe kisûfê nadetê

Westaye meh nîva kebed, menzilgeha burca esed
Derya li benda ma cemed, destê te’serrûf jê netê

Xurşîd û mah têk hilgirin, nûr û ’zîyaek ser birin
Gîya û xe’zra daîrin, e’tlesî l’banê gunbetê

Gunbeta xe’zrai û e’tles, xatema burca muqewwes
Dûre jê namerd û nakes, dil debayê zînnetê

Her divêt perde sivik bit, hûş û can daim li nik bit
Geh mezin bit, geh biçîk bit, pur li dinya û behcetê

Wechekê yêk taze bînim, serbiser perda hilînim
Ger du şî’ira vêt bixwînim, beytê ne’zma qî’setê

Teqdîreka ’sani’i kirî, erwe’h dimaî çêkirî
Şewq û zewq jêkra kirî, te’srîfî lê kir qudretê

Te’srîf û ’hîkmet her hebû, e’llah bi xû lê şehde bû
Her nefsekê ’hukumek hebû, teisîra a’slê neşietê

Hindî ji dil xudaperest, der ’husnê dilber mane mest
’Husn û cemala destî qesd, mexmûre der cem’îyetê

Hindî neda nûra cela, maîne teyhê mubtela
Her wê demê lê bû ’xela, ’halê li berqa cezbetê

Lew’h û qelem, derd û elem, jêra kirin endû we’xem
Çendî geda û mu’hteşem, carî dikin wê sunnetê

Çendî hebû erwa’h û zer, hindî li mewla kir ne’zer
’Işqa Xudê tê kir eser, cezban û tênev ’hîlmetê

Ew sulletê ehlê yemîn, hûn ewelîn û axirîn
Wan dîtibû ’eynûl yeqîn, ’tûba ji bû wê sulletê

Rêy’haneyê ’enber feşa, ’heyya elestê jê giha
Rû’hek ji rêy’hanê nema, venav dilê ’arif ketê

Navê muqerreb lew heye, çavê dilî bê perdeye
Mestî şerab û badeye, demdem dinûşît şerbetê

Şerbet çîye saqî didit, destê çepê dilber didit
Agir ji ’husna xû dikit, hemrajê keyfa ulfetê

Ger têşneyê ’husna wetê, ger bû xûyê, ger ne xûyê
Ger ba’xevanê ba’xeyê, ba’xê seray ’îrfanetê.

---

**Rûyspî: serberz.**
**Ûlfet: dûstayetî, hevalênî, hawrêyetî.**
**Cînsekin: cînsêkin, meta’i.**
**Serwer: gewreyî, mezin, serkêş.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 210

Tacê wîqar: tacê serberzîyê, tacê rastgûtinê, tacê rastgûyî û pakî.
Xasme: bi taybet, be taybet.
Pûştegîr: piştîwan, pîştîwan.
Mûşterî: kiryar.
Baî'i: kesê kû tiştî difrûşe, kesî ke şit efrûşrê.
Cama ceme: Pîyala padişayî Cemşîd Cebûlqayî.
Ba'xevanê we'hdetê: xûdaperistin, ba'xewanî yektayî.
Dedgeş: derhênan, înaneder.
Sîmûr'x: teyrekê xeyalîye, melêkî efsaneyîye.
Şehbaz: teyrekê be tiwane, şayî bazan.
Mahî: masî.
Sey'hûn: navê rûbarekîye (sey'hûn û cey'hûn navên dû rûbarane).
Yeksû: bi tenê li alîyekî, tenya le layêkewe.
Mewca lûcce: şepûlî lûcce, pêla lûcce.
Keştî: gemî, belem.
Mûd'xem: têkelbûn, têkraçûn, tevlihevbûn.
Sebba'h: melevan, melewan.
Xûrşîd: tav, hetav, hetaw.
Mehtab: mangeşew.
Şîn û 'saf: asmanê şîn û safî, bêgerd.
Kisûf: rojgirtin, rojgîran.
Bûrca Esed: meheke di salê de, mangêke le sal.
Derya: be'hr.
Xe'zir: gîyayê şîn, sewzegîya.
Gûnbet: asman, gûmes.
Bûrca Mûqewwes: meheke di salê de, mangêke le sal.
Nakes: xirab, nebaş.
Behced: xûşî.
Şewq û zewq: xûşî û şadî.
Mest: serxûş.
'Husn û cemal: ciwanî.

**Maîne: mawetewe, manewe, yên mayin.**
**Teyh: bin, di nav.**
**Mûbtela: tûşbûn, dûçar.**
**Qest: arezû.**
**Mexmûr: xûmar.**
**Berqa cezbetê: hêzî kêşanewe.**
**Endû we'xem: derd û xem, xem û xefet.**
**Geda: feqîr, sûwalker, perexwaz.**
**Mû'hteşem: dewlemend.**
**Eser: teisîr, şiwên danan.**
**Cezban: kêşanewe.**
**Sûlle: taîfe.**
**'Eynûlyeqîn: serkaniya rastîyê, serçawey rastî.**
**'Tûba: xuzge, xûzgam be, xûzge birya.**
**Elest: (elestû bîrebbîkûm) îşarete bû ayeteka Quranê.**
**Bade: mey.**
**Nûş: xwardnewe.**
**Hemraz: hawdil.**
**Têşne: têhnî, tihnî.**
**Ba'xevan: baxewan.**
**Ba'xê seray: ev dûnya, em dûnya.**

## Qenc û xirab

Paşî beyana kamilî, ’îrfaneyê rewşen dilî,
Çake beyankim cahilî, da hûn bizanin heyietê

Vêk nakevin qenc û xirab, têkhel nabin baz û ’xurab
Cînsek nînin ’teyr û dewab, jêkra nakin ûlfîyetê

Meyla cinsî cînsê xûye, heryêk li ’terzê xû çûye
Meyla cad û cadê weye, xirab nekin vê ’adetê

Heçê li vê rahê neçit, li ser ’terîqa xû neçit
Di gel hemî cinsî neçit, wi’llah dikêşit mî’hnetê

Wi’llah dikêşit cefayê, der dunyaê û ’uqbayê
Şûlek ji destê wî nayê, dê l’nefsa xû kit lûmetê

Heçî ’ebdê mûnafiqe, l’xeyrî cinsî mûwafiqe
Wi’llah ne ’ebdek ’sadiqe, bêşik dûre ji mirwetê

Dibêt çakî muwefiq bit, bi zar û dil yê sadiq bit
Da kû ne j’yêt mûnafiq bit, ezman muxalif nîyetê

Wekû te kesek ne vîya, paşî tekelûf bû çîye
Tekelûf jê nîfaqîye, me’ilûm dibî b’vê xesletê

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 213

Me’ilûm dibî her wê demê, fa’hiş dibî l’nik ’alemê
’Xemgîn di fikra wê ’xemê, xusran di gel nedametê

Xarîya qelb û zibanî, fa’hşîya ’eyba xudanî
Her kesek zû pê dizanî, bawerî kes pê netê

Xarîya ’hîleû ’hewala, gûtina wan qîl û qala
Fur’set û weqt û mecala, lê nebûrin muddetê

Şûla munafiq fa’hîşe, l’gûtina wan kin temaşe
Paşî jê xû bitin paşe, ’hetta kû tên ser tûbetê

Heçê şefa’et bû nebit, li dunyayê bê tûbebit
Xewfek l’qelbî da nebit, tirsa ’ezab û xeşîyetê

roja diçîte me’hşerê, pence hizarêt defterê
Sal lê dibûrin mehderê, naget şefî’ê ûmmetê

Hindî hene însan û cin, new’ek li ser dînî diçin
Ew laîqêt re’hmê dibin, roja kesbîû ‘hîrqetê

New’ê duwê di’zahirin, bêşik şeqî û kafirin
Ger ew li ser kufrê mirin, qet nabînin çu ra’hetê

New’ê sîyê misilmanin, ew bi ’zahir, bi îmanin
rojî û nivêj karê wanin, xûş ’zabi’tin ew b’sunnetê

Emma bi ba’tin kafirin, ew dê li ser kufrê mirin
Ew qencîyêt wan dikirin, jê negirin nef’îyetê

Heçî ’ebdê misilmane, şûla wî ’zulm û ’tû’xyane
Yan mu’înê yêk ji wane, ew kafirin li sekeratê

Aşkira gût pê'xemberî, sûndê dixûm bi ekberî
Kesê 'zulmê li ûmmetkirî, 'zulmî û cewr û ze'hmetê

Heçî yê aza muimîne, bêşik cefa di gel mine
Xelqû li xû hişyar bine, li min dikin 'zulmîyetê

'Zulmîyetê li min dikit, hindî 'zulmê l'mu'imîn dikit
Ew fê'ileke mezin dikit, kafir dibit bê şubhetê

Xudê dibêjit her weye, 'zulm di gel 'ebdê meye
Ewî karê şerî heye, di gel min û vê qudretê

Şerê di gel xaliq çîye, 'zulme di gel miskînîye
Heçê dilê wî şikandîye, ew muste'heqê le'inetê

'Zulma di gel pê'xembere, şer di gel mîrê ekbere
'Zulma feqîr bê 'zerere, be îsnad û rîwayetê

Menqûl bîye ji îsnadê, ehlê ficûr û fesadê
Yeqîn bikin î'itîqadê, dûrin ji fe'zl û meytetê

Der Încîlê û Tewratê, der 'Zebûrê û ayatê
Ehlê 'zulmû azayatê, kafir dibin bê şubhetê

Der dunyaê rezîl dibin, hem bê qedr û zelîl dibin
Dê d'qebrîda tebdîl dibin, şiklê 'heywana jêvetê

Hindek neymînk û xinzîrin, hindek reşin wekû qîrin
Hindek seyên ciwanpîrin, ew ji rengê mesxîyetê

Ew ji rengêt vê mesxêne, qewî neyarêt Xudêne
Di qebrîda l'vî şiklîne, dengê kîlaban jêvetê

Eger çi ’zahir ew tune, însan û hem şiklê mene
Der ba’tinêt mensûxene, ji rengê însanîyetê

Dil b’zanin kasa cebîne, neynika dûra emîne
Men’zerê şahê emîne, heq dizanit qîmetê

Dil her xezîna ekbere, ayîne rengê men’zere
’Zewiê gihande pencere, ’tarî dikit li rûiyetê

Nûra dilê însanîye, ji dîtina re’hmanîye
Şahê textê sul’tanîye, nakit zewala şewketê.

---

**Baz: teyrê baz.**
**’Xûrab: teyrê ’xûrab.**
**Dewab: pez û dewar, mer û malat, dabbe.**
**’Terz: ji reng, le reng, le şêwa.**
**Rah: rêk, rêga, cade, şeqam.**
**Mî’hnet: derdî serî, xem û xefet.**
**Cefa: xem û xefet.**
**’Ûqba: axiret.**
**Zar: ziman, ezman.**
**Tekellûf: tika, rica, teklîfkirdin.**
**Xe’sle: ’adet, xu, rewişt.**
**Nedamet: peşêmanî, pûşmanî, peşîmanî.**
**Xarîya qelb û zibanî: xirabî û çewtîya dil û ziman, bedî dil û ziman.**
**Weqt û mecal: kat û derfet.**
**’Hîrqet: sûtandin, şewitandin.**
**Şeqî: ehlî şeqawet.**
**’Zabi’t: bi rêkûpêk, be întîzab.**

**Ba'tin: derûn.**
**Mû'în: hawkar, harîkar, alîkar.**
**Aza: gûrc û gûl.**
**Cefa: xem û xefet.**
**Fî'il: kar, îş, firman.**
**Îsnad: belge.**
**Rîwayet: neqlî qewl.**
**Menqûl: neqilkirî, baskiraw.**
**Ficûr: xirabî.**
**Yeqîn: mitmanekirdin.**
**Zelîl: serşûr, xwar.**
**Tebdîl: gûhrîn, gûrîn.**
**Mesx: şewitandin, batilkirin, gûrîn.**
**Kîlab: seg, se.**
**Cebîn: enî, henye.**
**Neynik: mirêk, awêne.**
**Dûrr: tela, zêr û altûn, (tiştên giranbiha).**
**Xezîne: gencîne.**
**'Zewi: rûnahî, tîşk, rûnakî.**
**Rûiyet: bînî.**
**Zewal: tîyaçûn, le nawçûn, nabût.**

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 4:00 PM Page 217

**Şah û mîr**

Destî ji textê şah û mîr, lazim divêt bibirin feqîr
Destî dixuy kete qe'sîr, qet nabînit sîasetê

Ba'xek mêwe û ba'xek dile, yêkser binefş û sunbûle
Rengê gulê her bûlbûle, ba'xê gula sûlînetê

Gul bi xû tew'hîde têde, 'ta'etê 't'ena xû lêda
Dil diçû be'hra 'xemêda, 'xerqî di be'hra kurbetê

Hadir diçûn esrar û 'hub, cemayî dibin derd û kurb
Nendûre azar û şuhûb, xefîf tê ji ber quwetê

Ba'tinê pir nûr û quwet, sîneyê ehlê fitûwwet
'Sali'h û 'sa'hib mirûwet, na'zîre bi ferasetê

Der quwetê 'sa'hib rewac, dûre ji tîrî û lecac
Sellabî her tarac û bac, b'feraset e'ilemîyetê

Çendê bikit miskîn du'a, melek dê ben 'hetta sema
Qibûl dibin li nik xuda, hindî rîca kit d'ewetê

Feqîr ji dil kit ah û ûx, sarî ji ahê nar û dûx
Wi'llah dikit 'zalim pelûx, 'sûjît bi nar û 'hîrqetê

Heçî kesê 'ha'zir bitin, vê nusxeyê na'zir bitin
Ger xeşyetek 'zahir bitin, bêşik me 'îlmek dê getê

Xûş xûş bibîne vê demê, dûr be ji narê cehnemê
E'llah ji te dûrkit wê 'xemê, da qet nebînin şeqwetê

Navê te bûye 'zahire, hindî te qelbê 'tahire
Vê nûsxeyê çak hilgire, ev car se'adet bû tetê.

---

**Şah: 'hakim, sûltan, mîr.**
**Qe'sîr: kurt.**
**Binefş: rengê binefş, rengî pemeyî.**
**Sûlîn: gûla sûlîn.**
**'Xerq: niqûnbûn di nav avê de.**
**Hadir: yêkser, di gavê de.**
**Endûre: (enderan: di nav, le naw).**
**Sîne: mebest li vir "dil"e.**
**Fitûwwet: başî, çakî (wesfe bû mirûvê baş).**
**Na'zir: timîşaker.**
**Ferase: zîrek, zanayî, hûşyarî.**
**'Sa'hib rawac: kesê bi hêz, kesî be tiwane.**
**Lecac: behane girtin.**
**Tarac û bac: talankirin û birin (bac: 'zerîba îcbarî, pîtak).**
**E'ilemîyet: zanayî.**
**Pelûx: pelixandin.**
**Şihûb: sûtan.**
**Şeqwet: şeqawet, êş û azar, cezakirin.**

**’Hemd û şukur**

’Hemd û şukurê wî ’xefûrî, xûş dikit pêwîste Nûrî
Ey dilê qafîyê ’tûrî, ew dizanit ’hîkmetê

’Hîkmeta mewlayê baqî, her tu mûştaqê telaqî
Ah û dil pur îştîyaqî, bû wî’sal û ’he’zretê

Neynika canî bû cella, ’he’zretê ’erşê mû’ella
Sa’eta roja tesella, sîn û ’eyna ’xefletê

Sîn û ’eyna ’xefletê çû, ’î’htîyaca ’uzletê çû
Mîm û qafa dicletê çû, hem rê hebû j’uzletê

Kengî min ’uzlet vedibû, dil ji bû şînê meqer bû
’Uzletê hingê mefer bû, da ’emelkit ’sefwatê.

---

**Pêwîst: lazim.**
**Qafîyê ’tûrî: çiyayê ’tûrê sînai.**
**Iştîyaq: şewq, arezû, ’hez, xerîbî.**
**Wî’sal: pêk gehiştin, be yêk geyîştin.**
**Neynik: awêne, mirêk.**
**Cella: rûşin, pakî.**
**Mû’ella: mezin, gewre.**
**Tesella: kêyfxûşî, asûde.**
**’Ûzlet: tenyanişîn.**
**Şîn: giryan, şîwen.**
**’Emel: kar, îş.**
**’Sefwet: paqijîya dilî, pakî dil.**

**Ehlê 'hu'zûrê**

Sami'iû ehlê 'hu'zûrî, qenc bikin bawer ji Nûrî
J'vê sirrê nîne qusûrî, xûş dibînin dewletê

Guh dene mewla peristî, bendeyê ala di destî
Dil ji dunyayê veristî, dil di 'hubba axretê

De'iweta cama cemalî, xel'et û textê kemalî
Salikê cada wî'salî, dê be ru'hdanê getê

Meşheda 'eynûlyeqînê, ger bi 'heq bête kirînê
Dê be ruh'danî çînê, da bizanin qîmetê

'Husna zatê Zulcelalî, dil jibû daim dinalî
Zerreyek zanî bi 'halî, kefte ahê 'hîrqetê.

---

**'Hi'zûr: 'hazir.**
**Qûsûr: qûsîrî, kem û kas, kêmanî, natewaw, netemam.**
**Mewlaperist: Xwedê, Xweda, Xûwa.**
**Cama cemalî: mebest li vir "ciwanî"ye.**
**Salik: rêbwar, rêbirr.**
**Wî'sal: pêk gehiştin, be yêk geyiştin.**
**Rû'hdan: gîyanfîda.**
**'Eynûlyeqîn: ewey ke birwat pê heye.**